

Atlı, H. (2020). Tesewirên nasnameyî yên kurdên elewî û êzîdî di pêwendîya vegotinên gelêrî da. *Folklor û Ziman*, 1(2), 9-37.

Wergirtin/Received: 2020-05-02

Qebûlkirin/accepted: 2020-08-26

ORCID: 0000-0002-0868-3294

TESEWIRÊN NASNAMEYÎ YÊN KURDÊN ELEWÎ Û ÊZÎDÎ DI PÊWENDÎYA VEGOTINÊN GELÊRÎ DA

Hikmettin Atlî*

Kurte

Di avabûna nasnameya kolektîf da, li kêleka çend diyardeyên giring, dîn û bawerî hêmanên gelekî xurt in ku carinan, di hin periyodên dîrokê da, rê lê vedikin ku civak xwe li ser bingeha wan pênasê bikin. Di nava civaka kurd da jî, di gel nîqaşên giştî li ser nasnameya kurdbûnê, hin civakên etno-dînî hene ku, pênasîyên wan yên nasnameyî yên derbarê xwe da, hem nîqaşa li ser nasnameya kurdî kûrtir dikin û hem jî nîqaşa li ser nasnameya wan bi xwe jî derdixe meydanê. Dema ku em seyra dîrokî ya van nîqaşan datînin pêş xwe, tê dîtin ku ev nîqaş hem di asta civakê da û hem jî di asta lêkoleran da, tu car bi temamî li dû prensîbên zanistî bi rê ve neçûye. Di vê kontekstê da civakên elewî û êzîdî yên kurd, ji aliyê şenberîya vê nîqaşê ve, du mînakên gelekî giring in. Wekî îlaweyekê li vê nîqaşê, em ê berê xwe bidin metînen folklorî ku li wê derê ji tesbîtên derveyî bêtir, tesewirên civakî derdikevin pêşberî me ku ev yek meyla civakê ya objektîf dide der.

Peyvên Sereke: Folklor, kurd, elewî, êzîdî, etnîsîte, etno-dîn

* Xwendekarê doktorayê, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, E-mail: bedranh@gmail.com

**IDENTITY PERCEPTIONS OF ALEVI AND EZIDI KURDS
IN THE CONTEXT OF FOLK NARRATIVES**

Abstract

Religion and beliefs are crucial elements in the construction of the collective identity and in some periods of history communities take them as basis to define themselves. Although there are general debates on Kurdish identity within the Kurdish society, the existence of some ethno-religious groups and their self-definition deepens the debate on Kurdish identity in general and reveals the debate on their identity perceptions. When we look at the historical course of these discussions, it seems that this issue has never been carried out entirely in the light of scientific criteria, both on the social level and on the level of researchers' definitions. In this context, the Kurdish Alevi community and the Yazidi communities are two important examples of the concreteness of this debate. As an additional contribution to this debate, we will regard a look into folklore texts, where the concept of the society appears before us, and this shows the objective tendencies of that social group.

Keywords: Folklore, Kurd, Alevi, Ezidi, ethnicity, ethno-religion

Destpêk

Di qada zanistên civakî da nasname ji gelek alîyan ve hatîye analîzkirin. Lewra mirovek yan jî civakek di heman demê da dikare xwedîyê gelek nasnameyan be. Çawa ku silsîleya nijadî dibe sedem ku zanavek li me bê kirin wisa jî bawerîya me yan jî bawerîyên me dibin zanavek kategorîk li ser me. Çawa ku zayenda ku em pê hatine dinyayê dibe navek li ser me wisa jî statuya me ya civakî yan jî çînî dibe nasnameyek ji bo me. Çawa ku zimanê em pê diaxivin me wekî kategorîyek cuda pê nase dike wisa jî erdnîgarîya ku em li serê hatine dinyayê dibe hêmaneka bingehîn ya nasnameya me. Ev hêmanên ku di kesekî da dibin sedema dîyarkirina zanavî di heman demê da ji bo civakekê jî tîn heman maneyê.

Ev hêmanên ku em dikarin wekî tebeqe yan jî kategorîyên cuda pê nase bikin, carinan hemû bi hev ra digihîjin hev û nasnameyeka neteweyî ya hevpar pêk tînin û carinan jî kategorîyek yan jî hin kategorî li gorî yên din bêtir derdikevin pêş û dibin sedema derçûna nasnameyên cuda. Wekî mînak kesek dikare nasnameya xwe ya zayendî derxe pêş û jinbûn yan jî mêrbûna xwe wekî nasnameyeka herî berfireh li ser hemû kategorîyên din bibîne û xwe li dû zayenda xwe pê nase bike. Herweha kesek dikare heman miameleyê bi pevgerêdanên nijadî bike û nasnameya xwe li gorî vê kategorîyê pê nase bike. Nasnameyên çînî, zimanî û erdnîgarî jî di heman giringîyê da ne.

Di nava van hêmanan da yek ji hêmana herî giring dîn/bawerî ye ku di avanîya nasnameya etnîk da xwedî karîgerîyeka gelekî giring e. Li gorî Anthony D. Smith, di gel ku di nava civakên rojavayî da ji bo nasnameya etnîk, dîyardeyên ziman û nijadî bêtir li pêş in jî, di nava civakên rojhelatî da, dîyardeya dîn û bawerîyê bêtir xwedî bandor e. Smith weha dibêje: *“Her ku em ji Rojava ber bi Rohilata Navîn diçin, rola dînî di pê nasekirina etnîsîteya hevpar da ji ya zimanî xurttir dibe. Richard Frye jî di ‘The Heritage of Persia’ yê da îfade dike ku pratîkên dînî li gorî ziman di nasnameya civakî da bêtir li pêş in”* (Smith, 2002, r. 291-292).

Dema ku di civakekê da, dîn wekî dîyardeya bingehîn ya nasnameyê derkeve pêş yan jî ew civak bawerî û dînê/mezhebê xwe wekî faktora cudakar ya ji civakên derdorê derxe pêş, hingê li wê derê em rastî civakeka etno-dînî tînin. Yang û Ebough di vê mijarê da weha dinivîsin: *“Komên etno-dînî nasnameya xwe ya etnîk ne bi tenê bi rêya silsîleya nijadî û ne jî bi tenê bi rêya endamîtîya dînekî dîyar dikin lê bi kombînasyona van her duyan dîyar dikin. Komeka etno-dînî xwedî dîrokeka hevpar*

û kevneşopeka çandî ye –ku em vê dikarin wekî dîn jî bi nav bikin. Di piranîya mî-nakan da komên etno-dînî di heman demê da komên etno-çandî ne ku xwedî dînekî etnîk in. Di mînakên din da, komên etno-dînî yekîtiya xwe bi bawerîyeka hevpar çêdikin ku ev yekîti bi saya endogamîya ku rehên çandî û nijadî xurttir dike, dest pê dike” (Yang and Ebaugh, 2001, r. 367-368)

Wekî ku ji vê ravekirina Yang û Ebaugh jî diyar e, di avabûna nasnameya etno-dînî da, rola dîn û dîrokê yan jî bîra hevpar gelekî giring e. Bêguman xala dîroka hevpar yan jî bîra hevpar ya dîrokî xaleka wisa ye ku ew bi tevahî rola dîn bihêztir dike. Yanê ev bîra hevpar bi piranî bi serborî yan jî nakokîyên dînî ve girêdayî ye ku ev yek giranîya dînî ya di nava wê koma civakî da zêdetir dike. Di mînaka kurdên elewî û êzîdî da ev yek pir eşkere ye. Di vê mijarê da, Smith jî bi heman rengî difikire: *“Eger em dixwazin karaktera taybet ya nasnameya etnîk tê bigihîjin, lazim e em li bîra wan ya dîrokî binihêrin ku xwe di mît-sembolê da dide der. Lewra ya ku sîstema etnîk li ser pîyan dihêle parvekirina van mîtan e”* (Smith, 2002, r. 38)

Li gorî Smith, nasnameya bêbîr nabe. Lewra ew bîr e ku hertim hisa cudabûnê li ser pîyan dihêle û civakê di paşerojê da li dû hisên hevpar kom dike û bi vî rengî rê lê vedike ku civaka etnîk bi heman hisan li pêşeroja xwe binihêre.

Civaka etno-dînî çawa di alîyê manewîyata hevpar da van refleksan nîşan dide, wisa jî ji alîyê parastina demografyaya xwe ve jî helwestê nîşan dide. Ji van helwestan ya herî berbiçav endogamî ye. Endogamî yanê zewaca hundirîn ya nava koma etnîk ew çend giring e ku ew sînorên koma etno-dînî jî diyar dike. Di heman demê da qaîdeyên wê ne bi sînorên nijadî lê bi prensîbên dînî ve girêdayî ne. Daniel B. Gates di vê mijarê da weha dibêje: *“Di nava civakên pîretîk da yan jî civakên tîkel ku ji curbicur bîngihan pêk tên, bi piranî, dîn wekî sînorê derveyî yê zewacê tê dîtîn”* (Bates, 2009, r. 448)

Antropolog Thomas Hylland Eriksen jî, di vê mijarê da balê dikêşe ser korelasyonê di navbera civakên etnîk û dînî da. Li dû fikira Eriksenî, gelek tevgerên etnîk ji alîyê karaktera xwe ve dînî ne û pêwîstîyên dînî li endamên xwe ferz dikin. Li gorî wî civakên etnîk, dîn di çarçoveya kontrolkirina civaka xwe da û herweha ji bo parastin û pêşvebirina civaka xwe bi kar anîne. (Eriksen, 2004, r. 106)

Herçend hem di nava civakê da hem jî di hin mecrayên zanistê da, etnîsîte bi pevgirêdana nijadî yan jî bi nîşaneyên bîyolojîk hatibe îzahkirin jî, Frederick Barth li dijî vê nêrînê derdikeve. Li dû fikira wî komên etnîk li ser çanda hevpar ava dibin:

“Têgihîştina bingehên etnîk bi awayekî genetik, ne nêrîneka xwedî palpiştên qehîm e. Lewra, bingehên koma etnîk ku ew bi xwe wekî modeleka rêxistina civakî ye, ne bîyolojîk in lê çandî ne” (veg. , Hobsbawm, 2017, r. 88)

Bêguman gelek taybetîyên ku em dikarin ji bo komên etnîk rêz bikin di heman demê da ji bo komên etno-dînî jî derbasdar in. Di hemû komên etnîk da; pevgirêdana nijadî, ziman, xak, çanda hevpar û dîn xalên hevpar in. Cudahîya komên etno-dînî ji komên etnîk ev e ku ew di nava van her pênc hêmanên bingehîn da, hêmana dînî di radeya herî jorîn da derdixin pêş û ev yek dibe hêmana diyarker ya nasnameya wan.

Raoull Narol, wesfên bingehîn ku komeka mirov ji ya din wekî komeka etnîk cuda dike, weha rêz dike:

- “1. Di wê şîyanê da ye ku bi rengê bîyolojîk nesilê xwe, hebûna xwe bidomîne.*
- 2. Di formên çandî da, bi yekîtiyeka eşkere, nixê bingehîn yên çandî bi parve dike.*
- 3. Ji bo xwe, saheyeka komînikasyonê ya hevbandorîyê însa dike.*
- 4. Xwedî sîstemeka endamtîyê ye ku ew bi xwe wê pênase dike û ev ji aliyên din ve tê naskirin ku bi vî rengî di nava heman nîzame da kategorîyeka cuda ji kategorîyên din teşkil dike.”* (veg. Stern, 2014, r. 215)

Ev kategorîzekirina Narolî, ji gelek alîyan ve giring e. Narol, di xala pêşîn da bal kêşaye ser pevgirêdana nijadî û di xala dawîn da jî bal kêşaye ser sîstema endamtîyê ku ev pîrî caran di komên etno-dînî da wekî pevgirêdana dînî pêk tê.

Bi ya me, yek ji sedema esasî ku rê lê vedike dîn di xwepênasekirina civakan da bibe kategorîyeka bingehîn ev e ku ew sîstemeka endamtîyê ji bo wê civaka etno-dînî çêdike. Ev yek di heman demê da ji bo komên ku îdeolojîyekê dikin bingeh ji bo nasnameya xwe jî derbasdar e. Lewra hemû kategorîyên din ku nasname li ser wan însa dibe di bingeha xwe da kategorîyên xwezayî ne û ne girêdayî tercihan in. Ev yek tê wê maneyê ku kesek, wekî mînak eger ku bi kurmançî diaxive ji kurmançbûnê nabe ku bê derxistin/dûrxistin herweha eger kesek wekî mînak ji Dêrsimê be, ji Dêrsimîbûnê nabe ku bê derxistin/dûrxistin. Lewra wî/wê ev kategorî bi hatina dinyayê ve girtîye. Lê heman tişt ji bo dîn/mezheb/bawerî û îdeolojîyan ne derbasdar e.

Di civakên etno-dînî da çawa ku qebûlîya ji bo nava civakê girêdayî hin şert û rîtuêlên dînî ye wisa jî li dû encamdana hin şertan kesek ji wê civakê dibe ku bêderxistin/dûrxistin. Wekî mînak eger yek êzîdî be, li dû hin şertan ew dibe ku ji

êzîdîbûnê bê derxistin. Heman mînak ji bo elewîfîyê jî derbasdar e. Lewra dîyardeya dînî li kêleka afirandina manewîyata nasnameyê, di heman demê da derfetê dide dest elîtên civakê ku ew hin kesan li dû berjewendîyên xwe yan jî ‘civakî’ ji nava civakê derxin/dûrxin. Ev yek keyfîyeteka giring dide destê rêvebirên wê civakê.

Li alîyê din divê em balê bikêşin ser vê realîteyê ku nasnameya neteweyî û nasnameya etnîk hertim miqabilê hev nînin yan jî ser hev nagirin. Li gorî Immanuel Wallersteinî jî, di binê nasnameyeka neteweyî da dibe ku gelek nasnameyên etnîk hebin (veg. Pertev, 2018, r. 55). Nasnameya neteweyî wekî ku Anderson jî amaje pê dike bêtir tesewîrî ne lê nasnameyên etnîk xwedî spartekên şênber û qehîm in. Abbas Valî jî bi heman rengî qeyd dike ku têgiha etnîsîteyê di gelek waran da bi rengekî xelet li şûna nasnameya neteweyî tê bikaranîn. Valî destnîşan dike ku; divê *ethnie* bi awayekî baldar ji nasnameya neteweyî bê veqetandin (Valî, 2005, r. 86-87).

Curbecurîya çavkanîyên nasnameyê, ji du alîyan ve di dîyardeya nasnameyê da problematîk in. Yek jê heterojenbûna nasnameyê ye ku ev yek carinan di nava van hêmanên bingehîn da hevnegirtinê derdixe meydanê ya duyem jî tebeqeyîbûna van hêmanan e ku ev yek jî bi xwe ra konjektorîbûna nasnameyê derdixe pêşberî me. Yanê di hin periyodên dîrokê da li gorî pêdivîyên civakê yan jî elîtên civakê, ji van tebeqeyan yek yan jî hin jê ber bi pêş ve têne derxistin û hin jê jî bi paş ve tîn avêtin.

Ev heterojenî û pirtebeqebûna nasnameyî ji bo civaka kurdan jî bi heman rengî li dar e. Ev civaka ku çî ji derve da çî jî ji hundir ve di asta giştî da wekî kurd hatîye binavkirin, dema ku di asta mînor da bê vekolîn tê dîtin ku xwedî gelek cîyawazîyên giring e ku ev cîyawazî têrî înşakirina nasnameyên mînor dike. Ji van cîyawazîyên ku di xwe da meyla cudakarîyê dihewînin, yên herî giring, ziman û dîn/bawerî ne. Dema ku em ziman/zarava û dîn/bawerîyê wekî fokusa nasnameyê hîlbijêrin, di nava civaka kurd da em dikarin rastî komên wekî; kurmanc-sunî, kurmanc-elewî, kurmanc-şîe, kurmanc-êzîdî, soran-sunî, soran-şîe, zaza-sunî, zaza-elewî bîn. Bêguman em dikarin komên wekî; hewramî-sunî, hewramî-ehlê heq û lek/kelhûrî-sunî, lek/kelhûrî-şîe jî tevî van koman bikin. Wekî ku tê dîtin duwanzdeh kategorîyên cuda li pêşberî me ne û hin ji van koman wekî komên etno-dînî jî ketine lîteratûra lêkoleran. Elewî, êzîdî û ehlê heq/yaresanên kurd, di gel nasnameya jorîn ya kurdî, wekî komên etno-dînî jî tîn qebûlîkin.

Herçend ku hin lêkolerên wekî Bayrak û Izadyî, bawerîya ehlê heq û elewîtiya kurdan di heman xetê da nirxandibin jî di vê gotarê da em ê bawerîya elewîtiyê bi herêma wê ya navendî ya Dêrsimê ve girêdayî binirxînin. Di gel ku li gorî sînorên îroyîn elewîtiya kurdan jî sînorê Dêrsimê derbas dibe jî di dewrên berê da sînorên vê wîlayetê berfirehtir bû û piranîya elewîyên kurmanc û kirmanc digirte nava sînorê xwe.

Êzîdîti di gel ku xwedî navendeka dîyar e û li hin herêmên wekî Şêxan, Şengal, Xankê, Baedrê xwedî serdestîya demografîk e jî heta sedsal berê ew li her devera ku kurd lê dijîyan berbelav bûn. Hin eşîr hebûn ku bi tevahî êzîdî bûn û hin eşîr jî hebûn ku milekî wan êzîdî û milê din kurdên misilman bûn. Lewra ew li gorî elewîyên kurd bêtir di nava civaka kurdên misilman û sunî da belav bûbûn û bêtir xwedî vegotinên hevpar bûn.

1. Di Vegotinên Gelêrî yên Kurdên Elewî da Nîşaneyên Nasnameyî

Di vegotinên gelêrî yên herêmên kurdên elewî da, tezahura herî eşkere ya di heqê nasnameya etnîk da, kurmancbûn/kirmancbûn û elewîbûna wan e. Elewîyên ku li bakurê Dêrsimê li herêmên çiyayî dijîn û bi zaravayê kirmancî diaxivin, xwe wekî kirmanc bi nav dikin. Heta wekî herêm jî herêma xwe wekî *Welatê Kirmancîyê* bi nav dikin. Di heqê vê mijarê da qeydên herî kevin, yên li ser ozanê navdar *Sey Qajî* ne. Sey Qajî ku di sala 1936an da, yanî berîya Komkujîya Dêrsimê wefat kirîye, di gelek kilamên xwe da xelqê wê cîwarê wekî *kirmanc* bi nav kirîye (Cengiz, 2010, r. 35). Hem Sey Qajî û hem jî gelek dengbêjên vê herêmê têgiha kirmancîyê yan jî welatê kirmancîyê bi kar anîne ku ev têgih hem balê dikêşe ser ziman hem terîtorya û hem jî baweriyê. Ev rewşeka gelek balkêş e ji bo pênaseya nasnameya etno-dînî jî.

Kirmancî

“Roze ama disemiye

Wûris koto Anadolîye

Lawo pêrodê, ma pêrodime

Padisî kerdo qehpên û yintizar û babaxiye

Bixeleşnime şerefê Dêsim û kirmancîye”(Cengiz, r. 88)

Kurmancî¹

Ji rojan duşemî ye

Ûris ketîye Anadolîye

Lawo şer bikin, em ê şer bikin

Padşah qehpetî, întîzar û muxbîrtî kiriye

*Xelas bikin em şerefa **Dêsim û kirmancîyê***

Wekî ku em di vê kilama Sey Qajî da dibînin, Dêsim û kirmancîyê wekî du parçeyên ku ji hev nayên veqetandin li kêleka hev in. Di hin mînakên din da ev weha derdikeve pêşberî me:

Kirmancî

“Pêrodê, ma pêrodime

*Na qewxa **Dêsim û kirmancuna***

Aylîxa dewlete fîncanên axûyo

Nê werîna nê simîna” (Cengiz, r. 88)

Kurmancî

Şer bikin, em şer bikin

*Ev şer şerê **Dêsim û kirmancan e***

Meaşê dewletê fîncana bi jehr e

Ne tê xwarin ne tê vexwarin

Di vê kilama xwe ya jêrîn da Sey Qajî lome li kesekî dîke (Bertê Alê Gulavî) ku meseleyeka xwe birîye pêş dadgeha dewletê:

Kirmancî

“Ero Bertê Alê Gulavî

*To virno **torê kirmancîye***

Mi va dewa xo ra pîr û ravyerê xo ver fiye

Minê kokimî era ra û welaxû mefiye (Cengiz, r. 244)

Kurmancî

Erê Bertê Alê Gulavî

*Te **toreya kirmancîyê** guherand*

Min got: Dewa xwe bîne pîr û rehberê xwe

Min ê pîr ê kokim nexîne serê rêyan

¹ Wergerandina metinên kirmancî ji aliyê me ve hatîye kirin. Li cihê ku zanîna me têr nekirîye me ji alîkarîya nivîskarê pirtûkê sûd wergirtîye. Herweha me ji bo ku xeletî çênebin bi wergera wan ya tirkî ra jî miqayeseyê kirîye lewra ku nivîskarê pirtûkê kilaman hem bi orjînalê wan ya kirmancî û wergera wan ya tirkî daye.

Ev têgiha *torê kirmancîyê* bi heman rengî di nava kurmancan da jî wekî *edetê kurmancî* derbas dibe.

Li aliyê din, ji kilamên wî em tê digihîjin ku di têgihîştina wî ya kirmancîyê yan jî welatê kirmancîyê da kurdên sunî tune ne. Di gel ku Sey Qajî di hin kilamên xwe yên bi Şerê Êris ra têkildar, kirmancan (elewîyan) di nava 'umeta îslamê' da dîtîye û ji bo wan pênaseya 'şehîdên îslamê' bi kar anîye jî (Cengiz, r. 320), hisîyata wî li hember Serhildana Şêx Seîd ne bi heman rengî ye. Ew bi tundî li hember vê serhildanê derdikeve û ji perspektîfa dînî-mezhebî dinihêre.

Kirmancî

"Vanê paytaxtê padîşî rijîyo

Dewr dewrê Cumratî û Qajîyo

Hêfê Şêx Sayîd û Zazawuno ke yeno

Vanê: Mor û dînê Îslamîye dest şîyo

Qeda Estemol ra dariyo we

Amo bertengê Dêsim da nijîyo (Cengiz, r. 269)

Kurmancî

Dibêjin ku paytexta padşah hilweşîya ye

Dewr dewra Cumhûriyet û Gazî ye

Tu binêre li Şêx Seîd û van Zazayan

Dibêjin eywax! Mora Îslamê ji dest çûye

Bela ji Stenbolê rabûye

Di kilameka xwe ya din da Sey Qajî bi renekî eşkere kurdên sunî tawanbar dike û wan weka civakeka reqîb ji bo civaka Dêrsimê/kirmancîyê dibîne:

Kirmancî

"Cer sade ma hardo dewreso

Mîrê mi, cor asmenodekewo

Carû kirmancîyê de kês nêkoto

Binê dest û pawû

Mîrê zalimî do kistene

Xelîl Begê minê Yelaldîye

Eve destê Kurûnê Qereyajiye

Mîrê to woncenê soxir kenê duskinê

Cem û Cemate kirmancîye" (Cengiz, r. 438)

Kurmancî

Li jêr axa pîroz

Li jor ezmanê şîn şahidê me ye ku

Di kirmancîyê da tu kesê

Qebûl nekir ku bijî di nav dest û pîyan da

Bi mîrê zalim daye kuştin

Xelîl Begê min ê Yelaldîyê

Bi destê Kuroyên Qereyazîyê

Mîro! Dê di cem û cemata kirmancîyê da

Di vê kilamê da mebesta Sey Qajî ji *Kurûnê Qereyajiyê* kurdên sunî ne. Balkêş e ku elewîyên kirmanc yên Dêrsimê, di gel ku zaravayê wan eynî ye jî, zazayên sunî ji xwe nabînin, lewra di navenda nasnameya wan da bawerîya wan heye. Yanî têgihîştina wan ya nasnameyî ku bingeha xwe ji bawerîya wan distîne, bi hêmana erdnîgarîyê ve jî tam kelijîye û bi vî rengî wekî kategorîyeka cuda di nava erdnîgarîya kurdan da ji xwera hewzeyeka çandî-dîrokî afirandîye. Di vê helbesta jêrîn ya Sey Qajî da em têgihîştina vê koma etno-dînî ya welat dibînin:

Kirmancî

“Welat welat

Welatê xerî/cerî

Celvî marê amê

Celvê Mazxerî

Welat welat

Welat genîso

Qanûn rindo

Chetin hepiso

Merkeza parsena

Qizilkîlîso

Xarpêt rindo bira

Wondêr dizo phono

Amnono waxtê aşîrûno, nê warano

Çefê cinikono, peê dowano

Ho çarna Duzgîn Bava

Wertê Kuresano

Sorî Bava

Wertê Sadizano

Qozî Bava

Serê Qozano

Kurmancî

Welat welat

Welatê jêrîn

Li dû min celb hatîye

Celba Mazgîrê

Welat welat

Welatê mezin

Qanûn baş e

Zindan zor e

Tu bipirsî navenda wê

Nazimîye ye

Xarpêt rinde bira

Deşta dûz e

Havîn e, wexta zozanên eşîran e

Kêfa jinane, di nava dewkulan da

Min berê xwe da Duzgîn Baba

Navenda Kureşan e

Sorî Baba

Navenda Şadilîyan e

Qozî Baba

Li serê Qozanîyan e

Ho charna kara Melafîa

Qonaxê hîre rozano

Amû muxindiye

Dîwaro Kano

Sû Hewsê Goleke

Hewsê Dewres Chemalano

Ho charna kara Dewe

Hewsê Dewe wayirê Kuresano

Kêmerê Dûzginî, basê serê jarano

Ho charna bonê Kalferatî

Wayirê Arezano

Amû Hewsê Dêrûye

Hewsê Sey Sovinano

Şû Hewsê Dewres Yilaşî

Pîrê Moskano

Çewres Osporê Çelkaniye

Wertê Sa Weylano

Moro Şîa Persena

Wayirê Kêmano

Sultan Seyidê serê Baxira Sipiye

Nari Qeregolo dori çewres çe toliv û yel

Werte Bolevanano

Ho çarna kara Erzinganî

Kistim wertê tirkano

Şû Ewliyaê Bûkî

Mekanê wûzaxano

Ho çarna na ri

Sûlvîsê Çirixano

Şû Sûlviso bovere

Min berê xwe da Melefîyê

Qonaxa sê rojan e

Ez hatim Muxindê

Çûme Hewsê (Goristana) Golekê

Gora pîroz ya Dewrêş Cemal e

Min berê xwe da gund (Dewa Kuresû)

Hewsê Dewe xwedîyê Kurêşan e

Dûzgin Baba, serkêşê zîyaretên pîroz e

Min berê xwe da mala Kalferat

Xwedîyê Arezana ye

Hatim Hewsê Dêrûyê

Hewsê Sey Sovînan e

Çûm Hewsê Dewrêş Îlyas

Pîrê Moskan e

Çil hespên Çelkanîyê

Navenda Şah Welî ye

Eger pîrs bikî Moro Şîa (Marê Reş)

Navenda Kêmana ye

Sultan Seyidê li ser Baxirê Sipî

Alîkî Qeregol alîyê din çil talib yel?

Navenda Balabanan e

Min berê xwe da Erzinganê

Kistim, navenda tirkan e

Çûm Ewliyaê Bûk

Mekanê Ocaxan e

Min berê xwe da vî alî

Sûlvîsê Çirixan e

Çûm Sûlvisa alî din

Serê Pîrnîkano

Amû bonê Wûzaxî

Bonê Pîrbavano

Şû Xizirê peê Pirdê Sûrî

Wertê Arezano

Şû Gola Bûyere

Semtê Kalano

Şû Golê Xizirî

Wertê Heyderano

Ho çarna Hewsê Merxe

Hewsê Yivraymano

Toliv-muhîb venga chi dano

Şûne Warê Mirî

Ewliâê Kalikano

Werte ro vejûne ser, şûnê Koê Serî

Rûs û rûsnalê Xizirî

Mi vana bêbext mira sa vano

Mi nîadake Heso Bira

Vîneto, binê çimû ra tey nîadano

Mi va Heso! No waxtê şene û postû nîyo

Qêretê wûzaxano” (Cengiz, r. 404-408)

Li serê Pîrnîkan e

Hatim mala Ocaxan

Mala Pîrbavan e

Çûm Xizira li pişt Pirda Sor

Navenda Arezan e

Çûm Gola Bûyere

Semta Kalano

Çûm Gola Xizirî

Navenda Heyderan e

Min berê xwe da Hewsê Merxê

Hewsâ İbrahîman e

Talib-muhîb bangî wî dîkin

Çûm Warê Mirî

Ewliyayê Pîr û Kalan

Ji wir derketim rê çûm Koê Serî

Sûretê Xizir e

Min got hela ev bedbext çi dibê ji min ra

Min dît Hesoyê Bira sekinîye

Di bin çavan da dinihêre

Min go Heso ne wextê şan û posta ye

Wextê piştgirîya ocaxên pîroz e

Herwekî ku em di vê kilama jorîn ya Sey Qajî da dibînin, tesewira wî ya welatî bi tevahî bi herêmên kurmanç û kirmancên elewî sînordar e. Ev herêm Dêrsim û sînoren wê yên derveyîn Erzîngan, Meletî û Xarpêt e. Di vê vegotinê da welat; bi hîsên xurt yên herêmên cografîk, bi jîyana eşîrî û feodalîteyê ve girêdayî û di navbera vanan da wekî xerceka xurt, xerca bawerîya taybet ya elewîtîyê heye. Dengbêj bi xwe kirmanc e lê herêmên wekî Mazgîrd, Pêrtég heta eşîrên wekî Şadilî jî ku kurmancên elewî ne, di nava tesewira welat da dibîne. Herçend ku em ji kilamên wî tê nagihîjin ku xwe di nava tevahîya civaka kurdan da dibîne yan nabîne lê em di gelek kilamên wî da dibînin ku li hember desthilatdarîya tirkên neqebûlîya wî heye.

Kirmancî

“Lawo Aşîrene

Sima gilê tifongû çharno ra jumini

Ewro wertê simada lezo

Meste biro deweyî benê girani

Sima rê xeyle sare dezo

Nat û dota ginêne waro

Pêro cenco chayil û razo

No nê dowilo nê sazo ne kî cezo

*Sima weşenenê **Sey Qajî***

Vanê: Bêro şuare vazo

Ala şuare haza vindero

Wazanê ke tirk bêro

Sima Dêsimkanîye ra vezo

Mazûrîye da binê suxru û sepetûnê silû erzo”(Cengiz, r. 209)/*Bixe bin sepeta rêxê*

Kurmancî

Law Eşîrno

*We berê tivingan daye **hevûdin***

Îro ev e mesele di nava we da

Lê sibêroj mesele mezin dibin

Wê pir serê we biêşe di vir da

Ji her du alîyan jî yên ku dikevin ser axê

Hemû gênc û cahil û nûciwan in

Na ev ne dehol e ne saz e ne cihêz e

*Hûn gazî **Sey Qajî** dikin*

Dibêjin, bila bê kilaman bixwîne

Hela van kilaman bidin alîkî

Hûn dixwazîn ku tirk bènê

We jî Dêsimê derxin, li sirgûnê

Ji vegotinên gelêrî yên kurdên elewî em tê digihîjin ku ew bi pênaseya kurmanc yan jî kirmanc xwe ji tirkan vediqetînin yanê ji bo wan kurmanc yan jî kirmanc tê maneya nasnameya etnîk yan jî neteweyî lê li alîyê din bi pênaseya elewî jî xwe ji kurdên sunî vediqetînin. Li herêmên bakurê Dêsimê, bi taybetî herêmên ku kirmanc lê dijîn, rengê dînî-mezhebî balkêş e ku zêdetir dîyar dibe û derdikeye pêş. Lê herêmên wekî Mereş yan jî Meletî yan jî Perteg û Mazgîrd ku zêdetir kurmanc lê dijîn rewş diguhere. Di vê kilama jêrîn da ku li ser şerê Dêsimê hatîye nivîsîn ev yek eşkere tê dîtin:

Kirmancî

“Derê Laçî bivêso

Yivisê me gavano

Bira pêrodê, na qewxa eşîra niya

Merevê kirmanc û zalimê tirkano

Destê xo ra xo mecêrê

Sar ma rê qolaye vano

Pepûg bêro binîso

Cêncûnê ma rê biwano”(Düzgün, 1992, r. 83) / *Bila li ser xortê me bixwîne*

Kurmancî

Bila bişewite Çemê Laçê

Yivisê megavan e

Lêxin b irano, ev ne şerê eşîran e

Şerê mirovê kirmanc û zalimê tirkano e

Xo paş ve nekêşin

Bila navê me derneyê

Bila çûka pepûg bê venûse li vir

Wekî ku di vê mînakê da û kilama jorîn ya li ser Şêx Seîd da xuya dike, kirmanc yan jî kirmancên elewî, nasnameya xwe bi rengê pragmatîk, li dû konjektora heyamê dîyar dikin. Di vê mînakê da ew li hember tirkên xwe wekî kirmanc bi nav dikin lê di mînaka Şêx Seîd da, elewîbûna xwe derdixin pêş. Bêguman ew rewşeka xerîb nîne û wekî ku me di beşa destpêkê da jî dîyar kiribû, tiştê ku nasnameya civakan dîyar dike li kêleka dîrok û erdnîgarîyê di heman demê da konjektora demê ye jî.

Li dû nêrîna Gurdal Aksoy, nasnameya komeka civakî yan jî komeka etnîk, ne bi tenê girêdayî dînamîkên hundirîn yên wê komê bi xwe ye. Di heman demê da, civak yan jî çand û erdnîgarîyên, etnîsîte yan jî bawerîyên li hember wan jî di teşekula nasnameya wan da xwedî bandoreka giring in. Ji ber vê yekê, nasnameya kurdên elewî girêdayî têkilîyên wan yên bi desthilatdarîya tirkî û girêdayî dînamîkên navxweyî yên kurd û Kurdistanê diguhere. Herweha ji bo tu civakê ne pêkan e ku mirov behsa nasnameyeka neguhêrbar bike. Nasnameyên civak yan jî komên etnîk di konteksta şertên dîrokî da, di asta dem û mekanê da tûşî guherînan dibin. Wekî ku Aksoy dibêje, kurdên elewî yên Dêrsimê di jîyana rojane da xwe li hember tirkên wekî kurd yan jî elewî bi nav dikin lê li hember kirmancên sunî, xwe wekî elewî, Dêrsimî, kirmanc, kurdên elewî heta carinan wekî tirk pênase dikin. Dîsa li hember zazayên sunî xwe wekî kirmanc pênase dikin. Li vê derê tiştê ku rûh dide têgihê, ne bi tenê çibûna wê civakê ye lê di heman demê da kîbûn yan jî çibûna civakên cîran in jî (Aksoy, 2006, r. 31-32).

Kilama Memedalî yan jî Qasimoglu Memedalî, li herêma Mereşê ku kirmancên elewî ne gelek navdar e. Di vê kilamê da tê dîtin ku hêmanên dînî û etnîk gelekî likar in.

“Demê demê dem Elî ye

Demê demê dem Elî ye

Serê çavan ser kanî ye

Goçan le ser rê danîye

Elî dem e dem Elî ye

Deştê Kirbe ê be ber e

Tofanekê girtiye ser e

Lawkê min dixwaze were

Tornê hezretî Pêxember e” (Alxasî, 2003, r. 56)

Qasimoglu Memedalî, xortekî bist û pênc salî ye û serekê eşîrê ye. Di nava gel da tê gotin ku, Memedalî di destpêkê da naxwaze li hember dewleta Osmanî serî hilde lê hevsera wî ya bi navê Hûrî jê ra weha dibêje: “*Tu Qasimoglu Memedalî bî, elewî û kurmanc bî û alikariya Osmaniyan biki! Ev dibe?*” (Alxasî, 2003, r. 55)

Li vê herêmê wekî herêma kirmancên elewî, li şûna dengbêjan, bêtir aşiq yan jî ozan derdikevin pêş. Ew, wekî ku di mînaka dengbêjan da jî dîyar e, guh û dilê wan ji bûyerên ku bandorê li gel dike, vekirî ne û di kilamên xwe da van hisîyatan tînin ziman. Li herêma Meraşê, aşiqê navdar Aşiq Fedaî, di kilama xwe ya bi navê “*Ez kurmanc im*” da weha nasnameya xwe ya etnîk dide der:

“Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizanim

Berê vir de be birîn im, dilê min girtiye sizî

Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizanim

Bi min dikenin tirk û çete sankî ez ne însan im

Tubêçi hatime dunyê je canê xwe osang im

Dîn nebûme çi be çi ye her halekî dizanim

Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizanim

Li axa axan gir bûm mekteba min tunebû

Ez şivan bûm le zozanan hevalê min pez hebû

Negerim le tu welatan zimanê min ev hebû

Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizanim

Ya Heso ye ya Huso ye ya Memo ye navê min

Ya Elo ye ya Heydo ye ya Misto ye bavê min

Ez dixwazim rizgariyê belkî çavê min nabînin

***Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizanim*”(Alxasî, 2003, r. 84-85)**

Wekî ku em di van mînakên jorîn da jî dibînin, kurmancên elewî di eşkerekirina nasnameya xwe ya etnîk da, wekî kirmancên elewî helwest werdigirin û xwe wekî kurmanc û elewî bi nav dikin. Lê divê em vê yekê destnîşan bikin ku di hin mînakan da ku me li jorê nîşan dan, ferqeka giring di navbera kurmancên elewî

û kirmancên elewî da xuya dike. Kurmancên sunî jî piranî xwe wekî kurmanc bi nav dikin. Bi piranî referansekê dînî bi nasnameya xwe ve girê nadin. Herweha di piranîya mînanan da kurmancên elewî jî heman refleksê nîşan didin. Xwe pirî caran wekî kurmanc bi nav dikin. Ev yek rê lê vedike ku barîyera dînî-bawerî ya di navbera kurmancên elewî û kurmancên sunî da rabe. Lê ji bo kirmancên elewî, rewş cuda dibe. Ew hem di asta zimanî da hem jî di asta dînî da cudahîya xwe diparêzin û hertim wê refere dikin. Bi tenê di wan rewşan da ku xwe li hember tirkên îfade dikin, ji refereya dînî bêtir, rasterast kirmancbûna xwe derdixin pêş lê li hember civaka kurmanc û kirmancên sunî hertim cudahîya xwe ya dînî-bawerî destnîşan dikin.

Ev rewş jî du alîyan ve manedar e. Yek jê ev e ku di mînaka kirmancên elewî da, ew di du tebeqeyên nasnameyî da ji kurmancên sunî cuda dibin. Evana ziman/zarava û dîn/bawerî ne. Dema ku ev her du tebeqe tîr ser hev hingê cudabûna nasnameyî yan jî avabûna hisîyata etnîsîteyeka cuda hêsantir dibe. Ya duyem jî ev e ku di avabûna nasnameyê da rola dîkeyê hertim roleka dîyarker e. Wesfa ku li dîkeyê tê barkirin di heman demê da nasnameya koma etnîk jî dîyar dike.²

Rewşeka ku dişibe heman rewşa kurmancên elewî, ji bo kurmancên şîe yê li Xoresanê jî bi heman rengî ye. Ev koma civakî ya taybet wekî tê zanîn; bi piranî ji herêmên Berferatê koçber bûne û çûne aliyên Xoresanê. Ew, bi civaka faris yan jî turkmen ra dijîn ku ji aliyê mezhebî ve tu ferq di navbera wan da nîn e lê ji aliyê etnîk ve cudahîya wan kurmancbûna wan e. Di wan Sêxiştîyan da ku Celîlê Celîl û Gulê Şadkam berhev kirine, ev rewş, yanê refleksa nasnameyê xwe bi van rengan dide der:

“Palûzane, Palûzane

Şûna bînî kurmancan e

Gul û giya firêwan e (Celîl&Şadkam, 2012, r. 227)

Em we hewra du gurgînî

Du kevûte kurmancînî

Le xerîwiyê em zevicînî (Celîl&Şadkam, r. 99)

² Di vê analîzê da koma kurmancên sunî wekî navend hatîye dîtin. Ji ber ku ew ji alî erdnîgarî û demografîyayê ve piranîya civaka kurd teşkîl dikin pirî caran di navbera vê komê û mefhûma kurdbûnê da jî hevterîbîyek çêbûye.

Cergelane Cergelane

Li ser kurmênc bû tofan e

Ne hesp ma, ne pez, ne mayne (Celîl&Şadkam, r. 47)

Tekmerane, Tekmerane

Vira şûna rêkoçane

Va rêkoça kurmancane (Celîl&Şadkam, r. 263)

Va daweta kurmancane

Têye dengê bexşiyane

Bûk birine ulengane (Celîl&Şadkam, r. 274)

2. Di Vegotinên Gelêrî yên Kurdên Êzîdî da Nîşaneyên Nasnameya Etno-Dînî

Di nava civakên kurd da, yek ji koma giring ya etno-dînî ku xwedî endîşeyeka kûr ya nasnameyî ye; êzîdî ne. Bêguman sedema vê endîşeya kûr ev e ku her ku diçe hejmara wan kêmtir dibe. Ev koma etno-dînî ji ber ku di nava civaka kurd da bi rengekî belavbûyî dijî/dijîya (herçend ku xwedî navendên wekî Şengal, Şêxan, Baedrê bin jî) hem ji ber êrîşên kurd, ereb û tirkên misilman/sunî hem jî ji ber guhertinên dînî di nava demajoya dîrokê da, her ku çûye hejmara wan kêmtir bûye.

Li dû hin nêrînan; di destpêka peydabûna vê baweriyê da ku hingê wekî terîqeteka sunî û bi navê 'edewî' bûye, hejmareka giring ya kurdan endamên, şopînerên vê terîqetê bûne. Di Şerefnameya Şerefxan da jî behsa gelek eşîrên kurd ku bi eslê xwe êzîdî ne, tê kirin. Lê ji ber hevsengîya di navbera êrîşên civakên derdorê û radîkalîzebûna di baweriyê da, gelek bawermendên wê, dîne xwe guhertin. Yê mayî jî bi tevahî xeteka der-îslamî şopandin (Kreyenbroek&Reşow, 2011, r. 26). Di vê mijarê da vekolîner Bruinesen ji bi heman rengî difikire ku êzîdî ji nava çanda îslamî derketîye lê bi dû ra ji xwe ra xeteka serbixwe dîyar kirîye (Bruinessen, 2002, r. 28-29)

Ji ber van sedeman e ku wan dîwarekî stûr li derdora xwe rapêçaye û xwe ji civakên derve ra girtine. Bawerîya xwe, wekî hêmana bingeîn ya nasnameya xwe organîze kirine û bi tundî li hember têkilî û zewaca bi civakên misilman yê dora xwe ra rawestîyane. Ev helwesta wan di vegotinên wan da bi rengekî eşkere derdikeve meydanê.

Di vê kontekstê da, vegotinên sereke yê êzîdîyan jî endîşeyên wan yê hem-dem didin der. Herweha ev têgihîştina wan ya nasnameyî bandorê li hilbijartina wan ya çîrok û stranên dike. Pîrî caran ew van cureyan di vê çarçoveyê da ji nû ve însa dikin. Allison jî bi heman rengî difikire û weha dibêje: *“Bêguman çîrok û stranên evîne yê ku di nava civaka êzîdîyan da tene îcrakirin bi yê Kurdistanê ra hevpar in. Lê hilbijartina mijarê û awayên vegotinê yê di nava êzîdîyan da, endîşe û gumanên taybet yê ve civakê ji nêz ve didin der.”* (Allison, r. 233-234)

Di vê niqteyê da wekî ku Allison jî neqil dike; folklor lazim e xizmetê li civaka ku wê bi kar tîne bike. Allison weha berdeham dike: *“Dema ku mirov ji aliyekî ve dinihêre, tê dîtin ku êzîdî di nexşeya folklorîk da (ji aliyê cografî ve) hevparîyeka pir berbelav bi kurdên dî ra parve dikin. Lê vegotinên wan yê gelêrî, bi rêya bibîranîna rabirdûya eşîrî, derheqê hay jixwe hebûna êzîdîtîyê da, derheqê cudahiya di navbera êzîdîbûn û neêzîdîbûnê da gelek daneyan didin me.”* (Allison, r. 335-336)

Yek ji cudahiya girîng ya di navbera elewî û êzîdîyan da ev e ku, êzîdî li gorî elewîyên kurd, bêtir di nava civaka kurdên misilman da belave bûne. Ew ji Serhedê bigire heya Efrînê ji wir jî heya Şengal û Şêxanê li her deverê, di nava kurdên misilman da dijîyan. Ji ber ku ev civaka etno-dînî hertim bi cîranên xwe ra di nava nakokîyên dînî da bûn û li kêleka vê jî xwedî taybetîyên jîyana eşîrî û koçerî bûn; ew di heman demê da wekî veguhêzên folklorê civaka kurdan bûn. Herweha çanda dengbêjîyê jî di nava wan da gelekî dewlemend bû. Di nava kurmanç û kirmançên elewî da ev çand hema bibêje wenda bûye. Heta em dikarin bibêjin ku di sedsala dawîn da, xebatên li ser folklorê kurdan ji ber ku bi piranî jî aliyê kurdên êzîdî (yê karkasyayê) ve hatine kirin û çavkanîyên wan jî bi piranî kurdên êzîdî bûne, mohreka dîyar ya bawerîya êzîdîtîyê di xwe da dihevwînin. Hecîyê Cindî, Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl ku pêşengên van xebatan in di berhemên xwe da dîyar dikin ku piranîya vebêjên wan kurdên êzîdî ne (Celîl&Celîl, 2013, r. 18).

Êzîdîyên kurd, li gorî elewîyên kurd, di heqê nasnameya xwe da bêtir vekirî ne û ev yek di berhemên wan yê folklorî da eşkere xuya dike. Di nava kurdên elewî da meseleya nasnameyê pîrî caran ji bo wan ‘sir e’. Herweha ji ber şertên konjektora îbadetên wan, cemên wan heta îqrara wan jî ji bo wan sir e. Lê di nava kurdên êzîdî da heman rewş tune. Di berhemên wan yê folklorî û dînî da (Kreyenbroek&Reşow, 2011-Celîl&Celîl, r. 10-57) jî em dibînin ku ew hertim îşaret bi cudahiya xwe ya dînî dikin û civaka xwe û dînê xwe bilind yan jî yekane

dibînin ku ev yek rewşeka balkêş e. Li gorî êzîdîyan, demekê hemû Îran li ser rêça dîne wan bûye: “*Kevintirîn dîne dinyayê şemsanî bûye. Îranî û ecem hemî şemsanî bûn.*” (Şengalî, 2011, r. 50)

Li vê derê, ji şemsanîyê mebest; êzîdîtîyê ye. Şemsanî tê maneya perestina li rojê yan jî pîrozdîtina rojê. Şêx Şems, şexsîyetekî giring yê mîtolojîya êzîdîtîyê ye. Herweha, di gel ku elewîyên kurmanç û kirmanc xwe di nava îslamîyetê da dibînin jî, kurdên êzîdî, bi tu rengî xwe di nava îslamîyetê da nabînin. Herçend ku di mîtolojîya wan da xalên bi îslamîyetê ra hevpar gelek bin jî ew xwe bi tu awayî wekî misilman pênase nakin. Di vê mînaka jêrîn da ku me ji Hikayeta Xidirê Hebabî û Koçek Birahîm wergirtîye, ev têgihîştina nasnameyî eşkere xuya dike. Di vê hikayetê da Koçek Birahîm û Xidirê Hebabî hertim henekê xwe bi hevalê xwe yê belengaz yê bi navê Şêx Hecî dikin. Şêx Hecî gelek ji vê rewşê bêzar dibe û nifir li Xidir dike:

“*Şêx hevî ji Xudanê xwe kir, go: Tu Xidirê mezinê Gabara bikujî. Xidir emrê Xwedê kir. Rebilalemîn wisa kir, li bedena yekî Xatûnî li Behra Xatûniyê li holê li Sûriya dehr bû (hate dinyayê). Wextî emrê wî tîfalî bûye heft salî, dît ê li kirasekî **bisilman de ye**. Hîvî ji Xudê kir got: Mi bikuje. Vêca mir. Piştî emrê Xwedê kir, ruhê wî kete ber bedena jineke **Bebî bisilman** (Bebî eşireteka kurdê bisilman li ser mezhebbî şîe ne û li Şengalê da akincî ne). Dîsa emrê wî bûwe heft salî, xwe nas kir ke li kirasekî **bisilman de ye û şîe ye**. Hîvî ji Rebê xwe kir, dîsa bimiri. Piştî emrê Xwedê kir, Rebilalemîn, ew kir li bedena jineke Hebabî êzîdî (Eşireteka êzîdî ye li devera Şengalê). Li Çiyayê Şengalê dehr bû. Li bajarê Şengalê piştî emrê wî bûwe heft salî, xwe nas kir, got: **Xudêyo elhemdûlillah. Ez êzîdî me.**” (Şengalî, r. 74-75)*

Di vê pasaja jorîn da tê dîtin ku êzîdî, nasnameya xwe li hember nasnameya misilmanên şîe (kurd) û misilmanên sunî (kurd) wekî nasnameyeka cuda bi cih dikin. Herweha neqayilîya xwe ya li hember her du nasnameyan û yekanebûna nasnameya xwe, bi renekî eşkere tînin ziman. Heta ew di qewlên xwe yên dînî da vê yekanebûna bawerîya xwe di asteka pir bilind da, li ser hemû bawerîyan dinirxînin.

“Here turk e, here teter e
Ew xafilêt bê neder e (Ew cahil in, nêrînek wan tune)
Ewan jî Şêşims mefer e (Şêşims ji bo wan jî parêzvan e)
Here ‘ereb e, here ‘ecem e
Ew in xafilêt bê kerem e (Ew cahil in kerametek wan tune)
Ewan jî Şêşims pêşqedem e
File ku file ne
Bi keşîş û abûne ne
Ew jî li dû Şêşims diherine
Cihû ku cihû ne
Di selexfor û buxtan û nebûne (Tefecî, îftîracî û derewkar in)
Ew jî bi Şêşims bi recû ne” (Ew jî ji Şêşims bi hêvî ne) (Kreyenbroek&Reşow,
r. 358)

Di vê mînakê da xuya ye ku êzîdî bi nêrîneka tund û antî-semîtîk li cihûyan dinihêrin. Ev yek di hin vegotinên din da jî xwe dide der. Karakterên cihû, hertim di çîrokên êzîdîyan da bi ‘nebaşî’ û ‘dexesîya’ xwe derdikevin pêş. Heta ev ‘nef-reta’ êzîdîyan ya li hember cihûyan di mîtolojîya wan da gelek berbelav e. Êzîdî, Buxtulnesir yan jî Nebûqednezere ku qralê Babilê ye û yekem car qetlîfama mezin li ser cihûyan dike, wekî êzîdî û mirovekî qenc û pîroz dibînin.³

Destana navdar ya *Derwêşê Evdî û Edûlê* ji aliyê famkirina nasnameya etno-dînî ya êzîdîtiyê ve gelek giring e. Herweha em bi rêya vê destanê, derbarê derûniya nasnameyî ya vê civaka mînor da jî gelek tiştan fêr dibin. Di mînakên jorîn da, herçend ku hikaye bin jî, bi piranî ji hikayeyên wan yê dînî mînak hatin dayîn. Lê di berhemên folklorîk da carinan rews diguhere. Bêguman dîsa li ser nasnameya êzîdîtiyê israrek eşkere heye lê di vê mînakê da ew xwe bêtir di nava civakên kurd da wekî civakek cuda dibînin.

Di versiyona vê destanê da ku Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl ji zarê êzîdîyên Kafkasyayê berhev kirine, atmosfera neteweyî ya destanê hîn di destpêkê da weha tê neqilîkirin: *“Kîka û Mila kurd bûn, Gêsa ereb bûn.”* (Celîl&Celîl, r. 279)

3 Di Şerefnameya Şerefxan da jî behsa Buxtulnesir/Nebûqednesir derbas dibe û Şerefxan îdia dike ku ew kurdekî kelhûrî bûye. Dibe ku bingeha vê îdiaya êzîdîyan ji vê derê tê. (*bin Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname, Weşanên Avesta, Werg. Zîya Avci, Çap. 3. 2007, Stenbol, r. 409*)

Piştî ku Evdî biryar dide ku li hember ereban şer bike, şêxê ereba ku dostê bavê wî ye, wî hişyar dike û jê ra dibêje: “*Tu vegere nekeve nava me! Em busulman in tu êzîdî ye!*” Lê Derwêş weha bersivê dide: “*Apo erê bira ez êzîdî me. Bes ez eşîra Zor Temir Paşayê Millî me.*” (Celîl&Celîl, r. 286)

Dîsa jî dema ku mesele tê nav kurdan bi xwe, hingê êzîdî li ser nasnameya xwe ya dînî bêtir bi îsrar in. Wekî mînak di destanê da, Evdî demekê ji warê xwe dûr dikeve û diçe herêma Serhedê. Diçe bin konê Heyderan û Zilan û dibe mêvanê Ehmed Begê:

“Derwêş rûnişt. Go: Çaxê we bi xêr. Gotin: Bi xêr û silamet. Ew jî li ba êt ber derî rûnişt, li binê kwîn de. Pirs jê kirin, gotin: Ti ji ku yî? Go: Welle ji vê xerbê. **Tu çi miletî? Go: Welle ezê êzîdî me.** Ti êzîdî yî. Go: Arê wella.... . Yekî gote Ehmed Begê: Welle ev yekê êzîdî ye hatiye bin kwîn. Ehmed Begê ban kir go: Kurekî êzîdî hatiye bin kwîn? Derwêş rabû ser xwe go: Mamo ez im... Go: Tu êzîdî yî? Go: Arê wella. Go: Pa ne eyb e ji Derwêşê Evdî re, Derwêş êzîdî ye û Edlê bisilman e û dibêje ezê Edlê bim.” (Şengalî, r. 321-322)

Herçend ku di vê mînakê da dîyar e ku êzîdî dîsa xwe wekî komeke/etnîstî-teyeka cuda dibînin jî, dema ku em li tevahîya destanê dinihêrin, tê dîtin ku ew li hember erebên êrîşkar, xwe li kêleka kurdên misilman bi cih dikin. Lê di nava vê rewşa nakok da jî ew hertim xwerûbûna bawerîya xwe ya dînî nîşan didin û car caran sîtemê li kurdên misilman dikin.

Di vegotinên gelêrî yên êzîdîyan da, wekî mînak di strana *Dawidê Dawid* da, bêjara neteweyî li gorî vegotinên herêmên din, bêtir li pêş e.

*“Ezê hawar dikim hawar heye lê hindad ji me ra nayê
Heyfa mitêwê yekê destê xortê cana li darê keleşçe dan
Ferza Êzîdî na lê ew jî qismek ji me kurdan e”* (Allison, r. 398)

Di vê mînaka jorîn da tê dîtin ku êzîdî, wekî civak, xwe di nava civaka kurdan da dibînin. Lê hertim nasnameya xwe ya etno-dînî jî dîyar dikin.

Di strana *Ferîq Paşa* da, ku ji heman herêmê hatîye berhevkirin, bêjara dij-tirkî xuya dike. *Ferîq Paşa* straneka navdar ya êzîdîyan e ku temsîla dijderketina wan ya li desthilatdariya tirk û osmanîyan dike.

*“Osê Mecdî sê dengê gazî dike Sifûqê
Meto bavê Berces, Mihemê Evdo bavê
Saleh, Hemo Şero bavê Seydo, Gelî
Bav û bira mêrî çêbin destî xebatekî mêra bikin
Çavê xwe ji eskerê tirka neşkenînin
Destê xwe li çeqmaqî bipelînin
Îzna Xodê em ê weke dem û heywanê
Berî eskerê Ferîq Paşa bidine xopana Kerkûkê”* (Allison, r. 387)

Wekî ku di vê mînaka jorîn û gelekî mînakên din da jî derdikeve pêşberî me, di folklorê kurdan da tirk hertim bi temsîla xwe ya desthilardarîyê derdikevin pêş. Di gel ku di folklorê kurdan da ereb, ecem, xirîstîyanên suryanî, keldanî, ermenî, cihû li gorî taybetmendîyên xwe yên çînî-civakî di gelek rolan da derdikevin jî, tirk bi piranî ji bilî rola xwe ya desthilatdarîyê di folklorê kurdan da pir kêmxuya dikin.

Di Destana Kela Dimdim da ku ji zarê êzîdîyan hatîye gotin heman rewş derdikeve pêşberî me. Li gorî vê varyanta ku di sala 1931an da, ji alîyê Hecîyê Cindî, ji nava kurdên êzîdî yên Ermenistanê hatîye berhevkirin, dema ku Xan dikeve tengahîyê alîkarî ji mîr û eşîrên kurdan dixwaze. Gelek mîr û eşîr bi hawara Dimdimê ve diçin û yek ji vanan jî êzîdî ne.

*“Dor hate lawê **hekarî**
Li sêrî tora tarî
Ewî nig da hezarî*

*Dor hate lawê **hertoşî**
Te li sêrî qerepoşî
Ewî nig da koma berjojî*

*Dor hate lawê **divînî**
Xudanê şeşxana mezin î
Tu şerad î, kesê min î*

***Dor hate lawê êzîdî**
Şer xweş kirîye li çadira spî”* (Cindî, 2016, r. 178)

Di vê pasaja ji Destana Kela Dimdimê da jî xuya dibe ku civaka kurdên êzîdî, li hember xetereyên derveyîn xwe li kêleka civaka kurdên misilman bi cih dikin. Herweha di vê mînakê da dîyar e ku ‘dijmin’ dema ku ‘qizilbaş’ bin, êzîdî xwe bêtir motive dikin. Dibe ku ev ji saikên neteweyî nîn be lê ji saikên dînî-mezhebî be. Lewra hin lêkoler, êzîdîtîyê wekî mezhebeka tûj/hişk ya îslama sunî dibînin û tê zanîn ku kesên wekî Miawîye û Yezîd li cem êzîdîyan şexsîyetên pîroz in. (Bnr. Kreyenbroek&Reşow, r. 133-139)

Di *Destana Mîrza Kendalî* da jî têgihîştinên nasnameyî, bi cureyên wekî ku di Destana Derwêşê Evdî û Edûlê da derdikevin pêşberî me xuya dikin. Wekî mînak, sê zarokên bira ji ber ku birçîne, dikevin zevîyê pîvazan û xwedîyê zevîyê wan diqefêle.

“Hersêy da cem yek ketine nêv pîvaza û xudanê pîvaza pêgirtin.

-Kuro hûn ji ku ne?

-Walla em êzîdî ne.” (Şengalî, r. 150)

Di vê mînakê da nasnameya êzîdîtîyê ew çend li pêş e ku, di gel ku pîrsa ji wan, di heqê ji ku derê bûyîna wan da ye jî, ew wekî bersiv dibêjin: ‘em êzîdî ne’ Li vê derê, nasnameya dînî ne tenê li pêş nasnameya etnik hatîye dîtin herweha li pêşîya nasnameyên cografîk jî hatîye dîtin ku ev yek, yek ji xurtirîn hêman e ku nasnameyê ava dike. Bi awayek din, eger ku yek êzîdî be êdî ne giring e ku ew ji kîjan herêmê ye. Ya giring êzîdîbûna wî ye.

Di heman vegotinê da, Mîrza Kendalî ji aliyê Melek Cebraîl ve tê ziyaretkirin. Lewra Xuda jê xwestîye ku ew li kêleka Dewleta Osmanî, li hember Qizilbaşan şer bike. Li vê derê Cebraîl, temsîla Melekê Tawis e. Êzîdî hin caran li şûna Melekê Tawis dibêjin Cebraîl yan jî Emîn Cebraîl.

“Cebraîl hat, bin serî sekinî. Got: Mîrza!

Go: Çi ye?

Go: Kurê min tu nebêjî xewn e. Ez emînê Xudê me û Rebê te ez şandime, Melek Şêxsin nivîsiye û Şêşem mohr kiriye, qetla gawiristanîyê avêtiye destê te Xanê Xencerxan û gawirê qizilbaş bikuje û ti li feze’ a Sultan Mirad çî, li feze’ a Îslamî. Lazim e li feze’ a Îraqê çî. Lê nêrî... Eynen ew zilam e. Dîsanê her ji xwe fêm nekir, Cebraîl hinekî sivik bû û xwe unda kir.” (Şengalî, r. 154-155)

Di vê mînakê da em dibînin ku êzîdî şîeyan wekî 'kafir' dibînin. Di gel ku lêkolerên wekî Izady, M. Bayrak, di hin gotarên xwe da êzîdîtî û elewîtîyê yan jî bawerîya ehlê heq nêzî hev dibînin (ev her du bawerî pirî caran di nava şîetiyê da hatine dîtin), heta wisa îdîa dikin ku êzîdîtî, ji îslamîyetê bêtir, bermaya dîne kevnar yê îranî ye jî (Izady, 2013, r. 253), hem di termînolojîa êzîdîtîyê da û hem jî di vê pasajê da em dibînin ku termînolojîya êzîdîtî û îslamîya sunî bêtir nêzî hev in.

Êzîdî, dema ku xwe di cografyaya civakî ya derdora xwe da bi cih dikin, xwe ji niqteya nêrîna nijadî nabînin. Ew xwe li gorî bawerîya xwe tesnîf dikin ne ku li gorî rehên xwe yê etnîk.

Di berhevoka Îdrîs Farqînî da ku ji herêmên Xankê û Baedrê hatine berhevkin, di çîroka Mîskê (Mîrze) Zaza da ev yek bi vî rengî derdikeve pêş me:

“Axayek hebû li axa tirka jê re digotin Zaza. Zaza, axa bû, axayê Koçka Ridwanê bû. Ew î Zazayî li cihê xwe hikim li êzîdîya û bisilmana û li fila dikir. Hingê eşîr û axa hebûn, ew î hikim li xira dikir. Hege çend sal hatin û çûn dinya milkê Xwedê ji kesî ra namînit. Zaza emrê Xwedê kir. Westê emrê Xwedê kir, axa û eşîrên mintiqê, ê fila, ê bisilmana û ê êzîdîya derê Koçka Ridwanê girtin. Heta em axayek bo xwe danin, derê koçkê dê girtîbit.” (Farqînî, 2011, r. 11)

Di vê pasajê da tê dîtin ku deshilatdarî ji niqteya nêrîna etnîk ve hatiye pê-nasekirin lê vebêj, êzîdî di nava kategoriyên dînî da helsengandine û bi xirîstîyan û misilmanan ra bi hev ra telafûz kirîye. Herweha ev yek daxwaza wan ya wek-hevîyê jî ji aliyên nasnameya dînî ve dide der.

Destan Zembîlfiroş, li cem êzîdîyan xwedî giringîyek taybet e. Lewra civaka êzîdî, Zembîlfiroş wekî êzîdîyekî bawermend tesewir kirine. Heta binavkirina wî ya wek lawikê feqîr/rewal, dibe ku bi çîna feqîran ya statuyên civakî-dînî yê êzîdîyan ve têkildar be. Di wê varyantê da ku Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl berhev kirine, ev yek weha derdikeve pêş me:

*“Zembîlfiroş serê xwe datîne
Xewka şîrîn hiltîne
Xatûn Perî li ser serê xwe dibîne
Dibê: Dûrî min here, dûrî min here
Ez êzîdîme, tu surmanî (misilman)
Me'ra me hev nabire.”* (Celîl&Celîl, r. 190)

Di heman varyantê da, piştî mirinê, Zembîlfiroş diçe cenetê lê dibîne ku Xatûn li wê derê jî li dû wî tê:

*“Zembîlfiroş diçe cinetê, dergewanê cinetê xortek nû ye, navê wî Ahmed bûye. Divê: Kekê Zembîlfiroş, tu li van dera? Dibê ciyê Zembîlfiroş nîşan didê da, lê dinihêre Xatûn jî hatê da. Divê: Eva kî ye? Divê: **Eva surman e, mi kir nekir, lê xilas nebûm, îjar jî hatiye vira. Îjar erd dipîvin, sê gava lê dûr dixin.**”* (Celîl&Celîl, r. 193)

Qedexeya zewacê helwesteka kategorîk ya komên etno-dînî ye ku di mînaka destana Zembîlfiroş da derdikeve pêşberî me. Heman helwest di destana Derwêşê Evdî da jî heye. Bi taybetî di wan metinan da ku vebêjên wan êzîdî ne. Di wê metinê da ku Xeyrî Şengalî ji deverên êzîdîyên Şengalê berhev kirîye, ev rewş di nava qaîdeyên dînî yên civaka êzîdî da tê şîrovekirin. Ev yek di heman demê da hewla parastina demografyaya koma etnîk jî îfade dike.

*“Go Derwêş dil ketibû Edlê. **Pa vêca bi qanûna me êzîdîya, kêr nayê êzîdî jineka bisilman bibe. Derwêş êzîdî bû û Edlê bisilman bû.**”* (Şengalî, r. 310)

Bavê Derwêş, li hember zewaca wî derdikeve. Derwêş ji bo ku destûrê bigire, diçe Şengalê cem Babê Şêx da ku destûra zewaca bi Edlê ra jê wergire.

*“Çû dîwana Babê Şêx û kêfa Babê Şêx jê re hat bi qedr û merîfet. Bira rabû li ba Babî Şêx beyitî (?) li wê şivê. **Babê Şêx gotê: Kurê min Edlê kêrî te nayê, ê bisilman e. Çavê reş sipî nabe. Her Derwêş gotê: Mi divê ti li mi helal kî. Babî Şêx qebûl nekir. Gotê: Heke mi li te helal kir, ez ê li gelekê di helal kim.**”* (Şengalî, r. 312-313)

Di varyanta Uluçay da jî ku ji herêma Şengalê hatîye berhevkirin heman tema heye û hem bavê Derwêş û hem jî Babê Şêx destûrê nadin ku Derwêş bi Edlê ra bizewice.

“Derwêş:

Derdê min derdekî giran e

Derdê min evîn û eşqa dilan e

Evîndara min qîza Paşayê Milan e

Bavê min axayê Şerqîya û Dînan e

Mêrekî dîndar û şikestiyê ocaxan e

Rê nade evîna me her duwan e

Ez êzîdî me, ew jî misilman e

Babê Şêx:

Kurê mehra qîza Milan li te nabe

Qapî ji bo vê yekê venabe

Derwêş:

Babê Şêx bizane, derdê evînê derdekî giran e

Eşq bi xwe jî bi emrê Yezdan e

Ez ê bişkînim qapiyê olan

Ez ê ji xwe re biguhêzim qîza Milan e” (Uluçay, 2012, r. 187)

Encam

Bi rêya vê gotarê me hewil da em derxin meydanê ku vegotinên gelêrî yên civakekê di çî astê da temsîlên nasnameyî didin der. Lewra vegotinên gelêrî di nava civakekê da, ne bi rêyên rasterast be jî, di eslê xwe da wekî dokumentên dîrokî ne ku hin îdfiayan rast derdixin û hin îdfiayan jî pûç dikin. Bêguman her îdfiayeka zanistî bi vê yekê ve pabend e ku ne rewşeka îstîsnaî be û di binê hin şertên dîyar da heman encaman bide û di nava temsîleka manedar da xwe nîşan bide yan jî xwe dubare bike.

Bi rêya vê lêkolînê me dît ku herçend ku civaka kurd di asteka jorîn da xwe wekî kurd pênase dike û ev yek ji bo wan nasnameyeka hevpar îfade dike jî, belkî wekî ku Anderson jî îfade dike, ev texeyula wan be. Lewra di asta jêrîn da, carinan ev zanava hevpar tê qebûlkirin û carinan nayê qebûlkirin. Herweha eger ku zanava hevpar bê qebûlkirin jî tê dîtin ku bi taybetî civakên etno-dînî di îfadekirina nasnameya xwe da bi israr in. Lê ji bo civak yan jî komên etnîk, îdfiyên nasnameyî ne statîk in. Ew di pêwendîya dem, mekan û faktora dikeyê da diguherin. Wekî ku me di beşa destpêkê da jî dîyar kiribû, li gorî gelek zanyar û lêkolerên vê qadê, nasname, dîyardeyeka pirtebeqeyî ye. Bîngehên etnîk, ziman/zarava, dînbawerî, erdnîgarî û hişmendîya dîrokî hêmanên sereke yên van tebeqeyan e.

Di mînaka elewîyên kurd (kurmanc-kirmanc) da tê dîtin ku ew tercîhên xwe yên nasnameyî li gorî van faktorên ku me li jorê rêz kirin dikin. Wekî mînak dema ku elewîyên kurd bi rûsan ra şer dikin xwe di nava cîhana îslamî da dibînin û xwe wekî misilman pênase dikin. Dema ku nakokîya wan bi dewleta Osmanî/Tirkan

ra be, hingê xwe wekî kurmanç/kirmanç û welatê xwe jî wekî Welatê Kirmançîyê bi nav dikin. Dema ku konflikt bi kurdên sunî ra be li kêleka zanava kirmancîyê û kurmançbûnê, hêmanên dînî yên elewîtiyê jî li zanava xwe bar dikin.

Êzîdî di metinên xwe yên dînî û folklorîk da, tirk, ereb û eceman wekî dîkeyên xwe dibînin lê kurdên misilman wekî dîkeyên xwe nedîtine. Di vegotinê gelêrî yên ku civaka kurd bi civakekek din ra di nakokîyê da ye, wekî ku di Kela Dimdim û Derwêşê Evdî da derdikeve pêş me, civaka êzîdî bi rengê eşkere xwe li kêleka civaka kurd bi cih dike û kurdbûna xwe derdixe pêş. Lê di van rewşan da jî hertim tevlêbûna xwe ya nasnameya neteweyî, bi rêya kodên xwe yên etnîk bi cih tîne. Yanî tenê xwe kurd nabînin lê xwe wekî kurdê êzîdî dibînin.

Êzîdîbûn ji bo vê koma etno-dînî, meseleya man û nemanê ye. Ew di her rewşê da vê taybetîya xwe tînin ziman. Heta di hin vegotinên gelêrî da ev di wê radeyê da ye ku ew ji pirsên mîna; ‘hûn ji ku ne?’ û ‘hûn çi millet in?’ ra bersiva ‘em êzîdî ne’ didin.

Çavkanî

- Aksoy, G. (2006). *Dersim Alevi Kürt mitolojisi*, İstanbul: Komal.
- Allison, C. (2007). *Yezidi sözlü kültürü*, (çev. Fahriye Adsay), İstanbul: Avesta.
- Alxasî, A. (2003). *Ji Meraşê xeberek hat*, Stembol: Pêrî.
- Bates, D. G. (2009). *21. yüzyılda kültürel antropoloji*, (çev. Süavi Aydın), İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Bayrak, M. (2016). *Kürt batıniliğinde kutsal metinler*, Ankara: Özge.
- Bruinessen, M. V. (2002). *Kürdistan üzerine yazılar*, (çev. , Nevzat Kıracı), İstanbul: İletişim.
- Celîl, C. &Şadkam, G. (2012). *Sêxiştiyên kurmancî*, Wien: İnstituya Kurdzaniyê-Wien.
- Cengiz, D. (2010). *Dizeleriyle tarihe tanık Dersim Şairi Sey Qaji*, İstanbul: Horasan.
- Cindî, H. (2016). *Folklor kurmanciyê*, Amed: Lis.
- Düzgün, M. (1992). *Tayê lawikê Dêrsimî*, Ankara: Berhem.
- Farqînî, Î (2011). *Bi zarê êzîdiyan çîrokên gelêri (Ji deverên Xankê û Baedrê)*, İstanbul: J&J
- Eriksen, T. H. (2004). *Etnisite ve milliyetçilik, antropolojik bir bakış*, (çev. Ekin Uşaklı), İstanbul: Avesta.
- Hobsbawm, E. J. (2017). *Milletler ve milliyetçilik, Ayrıntı Yayınları*, (çev. Osman Akınhay), İstanbul: Ayrıntı.
- Izady, M. R. (2013). *Kürtler, Doz Yayınları*, (çev. Cemal Atilla), İstanbul: Doz.
- Kreyenbroek, P. G. &Reşow, X. C. (2011), *Tanrı ve Şeyh Adi kusursuzdur*, (çev. İbrahim Bingöl), 1. Baskı, İstanbul: Avesta.
- Oğuz, M. Ö. &Baki, Z. S. &Tekin, G. (Ed.), (2014). *Halk biliminde kuramlar ve yaklaşımlar IV*, Ankara: Geleneksel.
- Celîl, C. &Celîl, O. (2003). *Zargotina kurda*, Amed: Aram
- Pertev, R. (2018). *Folklor û nasnameya kurdî ya neteweyî*, Stenbol: Avesta.
- Smith, A. D. (2002). *Ulusların etnik kökeni*, (çev. Sonay Bayramoğlu&Hülya Kendir), Ankara: Dost.

- Stern, S. (2014). *'Etnik folklor ve etnisite folklorü'*, (çev. Başak Çalışkan), Halk biliminde kuramlar ve yaklaşımlar IV, Ankara: Geleneksel.
- Şengalî, X. (2011). *Li Çiyayê Şengalê qebqeba kewê nêre (Bergî Yekem)*, Duhok: Enstîtuya Kelepûrên Kurdî.
- Bedlîsî, Ş. (2007), *Şerefname*, (çev. Ziya Avcı), Stenbol: Avesta.
- Uluçay, Ö. (2012). *Destana Dewrêşê Evdî (tehlîl-tesnîf-kilam)*, Stenbol: Dîwan.
- Vali, A. (2005). *Kürt milliyetçiliğinin kökenleri*, (çev. Fahriye Adsay&Ümit Aydoğmuş&Sema Kılıç), İstanbul: Avesta.
- Yang, F. &Ebaugh, H. R. (2001). "Relligion and ethnicity among new immigrants: The impact of majority/minority status in home and host countries", *Journal For the Scientific Study of Religion*, 40, America: Journal For the Scientific Study of Religion